

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal:1983

Hejmar:11

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

## Nameyên xwendevana

Hejayan..

Slavêt şoreşgerî li webit,pir ji dil  
vî karê we yê heja pîroz dikim.Kovara ku  
lîlk cihê xwe di nav dilê me da girtiye.  
Kulîlk bi rastî "Kulîlk"e ji zarokên me  
ra.Ez pişikdariya vî karê weyê hja dikim.  
Vê carê min ji bo we sê çîrok û gotarek  
hênartin,hêvîdarim ku bi kêrî belav kirin  
ê bên, her peyveka ku xwendina wî giran be  
hun dikarin bi gorin. ...Min divê xwe bi  
we bidim nas kirin,ez ji Kurdistana başûr  
im,endamê yekîtiya nivîsevanên Kurd im li  
....Min sê sal li ser radyoya kurdî li...  
..ê kar kiriye.Bi nivîsandina program û  
çîrokan, li ser pişka zarokan.

Di gel vê namê min du wêne ên zarok-  
ên kurda bo we diyarî dikim

spas ji bo we

Birayê we  
Salimê Casimî



## EM Û ZIMANÊ ME

Di cîhanê de her Gelekî, her Netewekî bi zimanê xwe tête naskirin, di nava gelên cîhanê de. Pêvîste ku mirov berî her tiş tî zimanê xwe bizanibe, paşê xwe fêrî zimanê biyanî bike.

Ger ez bi zimanê xwe nizanibim ez neşim (nikarim) di gel milletê xwe bi axifim û bizani bim ka kul, xem û nexweşi yên wan çi ne û daxwaza wan çiyê. Bi rastî jî zarokên me hewcê çav dêriyek mezin in, ji ber ku zarokên me ji hemî xweşiyên xweşiyên bê pehrin. Divê em xwe bi wana re bidin westandin, pirtûk, kovar û rojname yên kurdî derxînin û dîroka wan bi wan bidin zanîn da ku zarokên me sibe roj xwe ji bîr nekin.

Lê çi mixabin, ev pirtûk û kovarên ku tînin nivîsandin, ewqas kêmin ku hejmarên wan tiliyên desta derbas nakin. Pir ji zarokên me nizanin bi zimanê xwe yê zîk makî bi axifin, lê ev pêtîviye li ser dê û bava ku zarokên xwe fêrî zimanê kurdî bikin, fêr kirina zimanê zîk makî berî her kesî dikeve ser milê dê û bava. Lê hezar mixabin, ku hinek ji dayk û bava zarokên xwe fêrî kurdî nakin û bikurdî di gel

wan naxifin, dibên ku em bi wanra bi kurdî  
bi axifin, ew zû fêrî zimanê biyanî (wekû  
Îngilîzî, Almanî, Swêdî û w.d) nabin, ji ber  
ku ew di dibistana da bi zimanê biyanî  
di xwînin.

Lê qey ew zarokên xelkê nabînin, ku du sê  
zimanê biyanî bi hev re di xwînin û fêr-  
dibin ?.

Ger zarokên me ji piçûkî de fêrî zimanê  
xwe nebin û bi zimanê xwe nexwînin, dema  
mezin bibin pir zehmet e ku fêrî zimanê  
xwe bibin.

Gelo gunehê zarokan çî ye ger dê û bavên  
wan wana fêrî zimanê wan nekin ?.

Salimê Casimî



## KURÊ MIN

Kurê min kurekî delal e,  
Aqil î firaset kemal e,  
Ziman î şêrîn î zelal e,  
Dikene, ji minre bihar e.

Kurê min kurekî şêrîn e,  
Gava ku dûr ve min dibîne  
Wê çawan dimeşe, dilezîne  
Beşerxweş xwe bimin re dighîne.

Wextê ew xwe davê hemêza min,  
Pê çiqas şa dibe dilê min,  
Lê çiqas şa dibe dilê min,  
Ew fêriz, gulana emrê min.

Rizaliyê REŞÎD



## ROVÎYE XAPONEK

Roviyek hebû û her şev diçû dikete mala pîrê û mastê pîrê dixwar.

Şevêkê pîrê xwe li rovî kire diz (xwe lê ni tirand) û ma hişyar. Bi şev mêze kir, ku ro vî hat û kete binê selika şîr. Pîrê şonika xwe hilda û hate rovî, dît ku wa ye dîvê ro vî li derve ye, pîrê bi şonika xwe got "kulp" li dîvê rovî da û dîvê rovî di ber de jêkir. Rovî reviya, çû nav hevalên xwe, hevalên wî lê civiyan û pê kenîn, jê re gotin "qolo molo ka dîvê te, qolo molo ka dîvê te?". Rovî pir bi ber xwe ket û paşt a vegeriya, çû cem pîrê û got:

- Dayê, pîrê, ez li bextê te me, tu dîvê min bidî min, ez nikarim herim nav hevalan, bi min dikenin û dibêjin "qolo-molo ka dîvê te?".

Pîrê je re dibêje:

- Here satilek şîr ji min re bîne, ezê dîvê te bi te ve bidrûm.

Rovî dide rê diçe ba bizinê û dibêje:

- Bizina baş, ez li bextê te me tu satilek şîr bidî min, ezê bibim bidim pîrê, pîrê jî dîvê min bide min, ku herim nava hevalên xwe da hevalên min bi min nekenin û nebêjin "qolo-molo ka dîvê te?".





Bizin dibêje:

- Ku tu ji min re pelê darê binî, ez têr bixwim ewê şîr tekeve guhanên min û ezê satilek şîr bidim te, dê tu jî herî bidî pîrê, dê pîrê dûvê te bide te û dê tu jî herî nav hevalên xwe, ew jî êdî dê bi te nekenin, nebêjin "qolo-molo ka dûvê te ?".

Rovî radibe diçe ba darê û jê re derdê xwe dibêje:

- Darê darê ez li bextê te me, tu hinek pelên xwe bidî min, ezê bidime bizinê, ewê satilek şîr bide min, ezê bibim bidim pîrê û ewê jî dûvê min bide min, da bikaribim biçim nava hevalên xwe ku ew jî bi min nekenin û nebêjin "qolo-molo ka dûvê te ?".

Dar dibêje:

- Ku tu avê bidî min ez vexwim dê pelên min hêşîn bibin, ezê pelan bidim te dê tu bibî bidî bizinê, ewê satilek şîr bide te, dê tu bibî bidî pîrê, ewê jî dûvê te bide te û dê tu jî herî nav hevalên xwe, ew jî êdî dê bi te nekenin û nebêjin "qolo-molo ka dûvê te ?".

Rovî dide rê, diçê ba avê û jê re dibêje:

- Avê avê ez li bextê te me, tu werî darê

av bidî, da dar pelan bide min, ezê bidim bizinê, bizin satilek şîr bide min, ezê şîr bibim bidim pîrê, pîrê jî dîvê min bide min da bikaribim biçim nava hevalên xwe, ku ew jî bi min nekenin û nebêjin "qolo-molo ka dîvê te?".

Av dibêje:

- De here ji keç û xortên gund re bêje bila werin li ser min govendê bigrin, ezê werim darê avdim.

Rovî diçe ji keç û xortên gund re dibêje, ew jî tîni li ser avê govendê digrin, av pir dibe diçe ser darê, dar hêşîn dibe, rovî diçe binê darê, dar pelên xwe diweşîne, rovî pelan dibe dide bizinê, bizin dixwe, şîr dikeve guhanên wê û satilek şîrê xwe dide rovî, rovî şîr dibe dide pîrê. Pîrê radibe dîvê rovî bi gulik û gulbend dike, bi xiştik û miştik dike û pe ve didrû. Rovî dibêze diçe nav hevalên xwe. Hevalên wî lê dicivin, dibêjin "heval te ev dîvê xweşik ji ku peyda kir?". Rovî dibêje wan:

- De werin ez ji we re bêjim.

Tev tîni li rovî dicivin, rovî ji wan re dibêje:

- Ez ji êvar de çûm û min dîvê xwe xist nava avê, serê sibê min derxist û hatim cem



we, hun jî wek min bikin, dê dîvên we  
jî weke yê min bibe.


Tev diçin ji êvarê de dîvên xwe dixin a-  
vê, av diqerise cemed digre, serê sibê  
dîvê teva di binî de jê dibe û rovî bi  
wan dikene û dibêje "qolo-molono kanî dî-  
vên we, qolo-molono kanî dîvên we ?".

Hemû serên xwe didin ber xwe û ji rovî  
dûr dikevin.

SIYABEND A.







ALA MIN

Kesk û Sor, Spî û zer ala min e  
Keskê biharê dayika min e  
Sore ji xwîna Şehîdên min e  
Xwîna Şehîdên min nextê welatê min e

Zere, roja cejna min e  
Spîye dilê milletê min e  
Xortên Şoreşger her hevalên wêne  
Marksîzm û lenîzm rêça min e

Karker û gundî xelaskarên min e  
Birîndare dengê welatê min e  
Serxwebûn û azadî daxwaza min e  
Kurdistan, dîn û îman û malê min e

1.5.1983

BİRÎNDAR

## DEWLEMENDIYA BAVÊ MIN SERÊ WÎ BIXWE

Dewlemendiya bavê min serê wî bixwe  
Qîza bê dil xapand û ji min re anî  
Agir û pîşo li ser dilê min danî  
Heft roj bi hevdû re, bi jin û mêranî  
Nebû roja heşt min telaq di dest de danî

Qîza belengaz feqîr û hetikî  
Ne min û wê li hev kir, ne heskiryê wê ew anî  
Qîza bextreş li xwe xist: "Pepûk pepûk  
Ma ne rû reşiyê ez bê dil kirim bûk"

MALWÊRAN

31.3.82



# *dadgeh*

Zivistaneke zor bû. Şêr, gur, rovî û hespek di şikeftê de asê bûbûn. Ji ber berf û bahozê nedikarîbûn derkevik derve. Hemî di hundir de birçî bûbûn û tu xwarin tune bû. Diviya bû ku yek ji wan were xwarin, lê bi çî awayî.

Her wek ku mafên me gişan heye, em dê dadgehê saz bikin û ewê ku tawanbar (Mehkûm) bibe, ew dê bête xwarin. Şêr bû serekê dadgehê. Ji ber ku mezinê heywanan ew e.

Şêr pêşî ji gur pirsî:

- Te heya niha çî zîrar daye xelkê ?
- Min pir mih û berx xwarine û gelek ker kuştine, bi Xwedê min çend însan jî kuştine.

Şêr got: - Ev ne guneh in.... ev mafê te ne.

Dor gihişte rovî:

- Min pir mirîşk û dîk xwarine, gelek cara penîr û mastê gundiyan xwarine. Min dizî kiriye û gelek çûk û teyr jî xwarine.

Serekê dadgehê got:

- Ev mafên te ne, ne guneh in.





Dor gihişte hespê:

- Min di jiyana xwe de guneh û bêmafî nekiriye. Her ji însanan re xizmet kiriye, erebe kişandiye, însan li min siwar bûne.

Dadgeh:

- Te get zîrar ne daye, baş bîne bîra xwe!

Hespî:

- Belê ez benî. Rojekê bihar bû, giya nû hêşîn bibû, barê min jî pir giran bû, ez birçî bûbûm, min ew giyayê teze xwar.

Dadgehê li ser vê axaftina hespî biryar da;

- Ji vî gunehî mezintir guneh tune ye. Dibe ku ev giha şivek dar bûya, dê mezin bibûya û feyde bidaya însanan, rêwiyên ku biwestiyana wê li bin sîha darê runiştana. Lê te gunehêkî mezin kir, te ew giha xwar.

Dadgehê biryara kuştina hespî da. Şêr, gur, rovî hesp kuştin û xwarin.



## SÊ BIRA

Di wextekê de pîrek û sê kurê xwe hebûn. Parçekê zeviya wan hebû. Her sal ew parçeya zeviya xwe diçandin û dikirin genim.

Kurên pîrê yê piçûk diçû ber berx û karan yê navîn cot dikir û yê mezin jî dîwarjen bû, ango dîwar lêdikirin.

Wan her sal zeviya xwe dikirin genim. Her sal çaxa wan zeviya xwe dikirin genim, genimê wan bilind dibû ji gundekî din devekî dihat xwe nava genim dixist, ew tev pelixand û diçû. Her sal bi vî awayî genimê wan xirab dibû û bê qût diman.

Salekê her sê bira biryar dan, ku wê devê bigrin û wê serjêkin da ku genimê wan nema xirab bibe. Wê salê cardin zeviya xwe dikin genim, genimê wan digihê û bilind dibe. Her sê bira xwe di nava genim de vedişêrin û li benda hatina devê dimînin. Piştî qederekê deve tê û dide nava genim. Her sê bira radibin devê digrin î wê dibin malê. Ji ber ku diya wan eqlê wê hinekê sivik e. Dixwazin haya wê pê nexin. Radibin her sê bira ji diya xwe re dibêjin:

- Dayê, emê te bikin bûk
- De lawo lo, ez pîrbûme
- Na dayê na, tu hê ciwan î.



Radibin cilên bûkan li diya xwe dikin, wê li ser pişta devê siwar dikin, şerbikek şekir jî ji bo wê li erdê dixin û dişkînin. Radibin devê liwir serjêdikin û goştê wê dixwin.

Ji dilê pîrê ku ew bi rastî bûye bûk. Hew qasî ku kêfa wê tê. Di ser re demek derbaz dibe, xwediyê devê radibe li deva xwe digerre û derdikeve nava gundan. Xwediyê devê pir diçe hindik diçe rastê berxvanekî tê. Ew jî kurê pîrê ye ku deva wî diziye. Xwediyê devê silav lê dike,

- Selam û eleykûm, qewet be ji te re birako  
- Eleykûme selam we rehmetillahî berekatûhû.  
Xwedê ji te razî be, rehma Xwedê li dê û bavê te be.

- Birako, berê niha deveke min winda bû, Ma gelo te ew ne dîtiye ?

Berxwan xwe ji qestî şaş kir.

- Bi Xwedê ez kar û berxên xwe baş diçêrînim.

Xwediyê devê aciz bû,

- Heyran gelo te deva min ne dîtiye ?

- Bi Xwedê kes nikare weke min kar û berxan beçêrîne.

Xwediyê devê yek car aciz bû:



- Heyran qeşmeriyan neke, gelo te deva min ne dîtiye?

- De ka were bîne bê ji min û te kî bêtir dikare karvaniyê baş bike.

Xwediyê devê:

- Wey Xwedê bela te li te bixe lawo, qey Xwedê piçek hiş ne xistiye serê te,

Xwediyê devê dev jê berda û di rêya xwe de dom kir û çû. Pir çû, hindik çû xwediyê devê rastî cotkarekî hat. Ew kurê pîrê yê navînî ye.

- Selamû eleykûm, qewet be birako

- Eleykûm selam, Xwedê ji te razî be

- Ma gelo te deva min ne dîtiye lo ?

Cotkar xwe şaşomaşo kir:

- Bi Xwedê ez cotê xwe pir baş dikim

Xwediyê devê aciz bû:

- Xwedê jê razî, ez li deva xwe dipirsim

Cotkar:

- Bi xwedê kes weke min nikare xweşik cot bike.

Xwediyê devê pir aciz bû:

- Qeşmeriyan neke heyran, ez li deva xwe dipirsim.

Cotkar:

- De ka were bê ji min û te kî dizane xweş





cot bike !

Xwedyê devê:

- Wey qeda xwedê bi te jî keve lo, ev tev dîn in kuro, ez îro li dînan rast hatim.

Xwedyê devê dev ji cotkar berda û çû şopa deva xwe de.

Xwedyê devê pir çû, hindik çû, carekê rastî dîwarjenekî hat, ew jî kurê pîrê yê mezin a e.

Xwedyê devê silav lê kir:

- Salam û eleykum, gewet be ji te re birako!

Dîwarjen:

- Xwedê ji te razî be

Xwedyê devê:

- Ma ew Şivan û cotkar birayên te ne ?

Dîwarjen:

- Erê her du jî birayên min in.

Xwedyê devê:

- Bi Xwedê herdû birayên te jî dîn in

Dîwarjen:

- Erê, herdû jî ji hev dîntir in.

Xwedyê devê:

- Başê, berî niha deveke min winda bûbû, ma gelo te deva min ne dîtiye ?

Dîwarjen:

- Bi Xwedê ez dîwarên xwe pir rast lê dikim.



Xwediyê devê aciz bû:

- Xwedê jê razî, ez li deva xwe dipirsim  
Dîwarjen:

- Bi Xwedê tu kes nikare weke min dîwaran lê bike.

Xwediyê devê yekcar dîn bû:

- Qeşmeriyan bi min neke, ez li deva xwe dipirsim.

Dîwarjen:

- De ka were, çend kevira lêke, em binêrin bê kî ji me dizane xweş dîwaran lêbike !

Xwediyê devê:

- Wey çeda Xwedê bi te jî keve. Tu ji birayên xwe hê dîntir î, ya baş ez ê herim cem diya we, ew niha bi aqil e.

Dîwarjen:

- Raste, diya me ji me teva bi aqiltir e.

Xwediyê devê rabû çû cem diya wan. Diya wan li mayê hevîr dikir.

Xwediyê devê ji pîrê pirsî:

- Pîrê, berî niha devê min winda bû, ma gelo te ew ne dîtiye? min ji lawên te pirsî, lê ew her sê jî dîn in. Niha tu bi aqil î.

Pîrê ya rastîn got:

- Bele lawo, min ew dît.

Xwediyê devê:

- Başê te ew kengî dît ?

Pîrê ya rastîn got:

- Bi Xwedê çaxa ez bûm bûk, ew ji min re ser-  
jêkirin.

Xwediyê devê yekcar dîn bû:

- Tew tew tew... Pîrê ji lawên xwe jî dîntir e.  
Deva min berî niha bi mehekê winda bûye, ew  
radibe qala ciwaniya xwe ya bi bîst salan di-  
ke. Howeh kuro, qey kesekî bi aqil di vî gun-  
dî de tune ye bavo !

Xwediyê devê rabû destê vala vegeriya mala  
xwe û deva deva xwe winda kir.

Hersê bira jî bi fen û fûtan ew xapandin û  
ji xwediyê devê xelas bûn. Îcar her sal bê tirs  
zeviya xwe diçandin, genimê wan bilind dibû,  
havînê ew diçînin û pê debara xwe dikirin.



Karik namînin li bin selika  
Wê rojek derkevin meydana şera,  
Wê bên rojên dengê aza,  
Ew e, gotina Feqiyê teyra  
Milet timî namînin tengezar  
Wê hildin tîr û kevan binar,  
Wê biqetînin qeyd û çîdar.  
Wêran bikin hepsa mîrê zihar  
Ezê qelem û defterê xwe daynim  
Tevî we şûr û mertala hilînim  
Bona welatê bavê xwe sêbikim  
Zimanê dayka xwe bi ziyareta zewkim  
Feqiyê Teyran



## SERPÊHATÎ

### NÊÇÎR

Li gundekî merivekî seqet(şel)û nêçîrvan hebû.Navê wî Boxdî û navê jina wî jî Zekîna bû.

Rojekê Boxdî çû êzingan û dehfikên xwe jî bi xwe re birin.Boxdî dehfikên xwe bir veda û çû dest bi birîna êzingan kir.

Piştî ku êzingên xwe qedandin,hate cem dehfikên xwe.Dît ku wa ye Kewek di dehfikê de ye.Rabû Kew girt û hanî malê,wî û malbata xwe xwarin.Di ser re demek derbas bû û havîn hat.Boxdî cardin,rojek rojekê çû êzingan û tifinga xwe jî bi xwe re bir.

Boxdî bi tesadufî kewek din jî kuşt û hanî malê xwarin.Boxdî êdî di nefsa xwe de bû nêçîrvanekî pir mezin.Gundî newêribûn li cem wî rûnin.Her ku Gundî li cem Boxdî rûdiniştin,Boxdî digot:

-Kuro ma kes weke min nêçîrvan heye!.Ez li nikulê kewan dixim....

Wî pesnê xwe pir dida.Ne rojek,ne du roj ne carek û ne du car,gotinên waha her dom dikir.

Carekê dîsa Boxdî di nav gundiyan de pesnê xwe dida,ji nişkeve jina wî Zekîna di

ber wan re derbas bû û dengê mêrê xwe  
seh kir, ku wa ye ew pesnê xwe dide û  
devê gundiyan jî maye vekirî. Zekîna li  
ber civata wan sekinî û got:

-Bi serê bav û birê min, ev çend sal e  
ku em bi hev re ne, Boxdî ji bilî du kew  
an tu kew ne kuştin.

Gundiyan ku li wê derê rûniştî bûn, tev  
bi Boxdî kenyan, Boxdiyê reben serê xwe  
berda ber xwe û ji wê derê bi dûr ket.

ÛSIV TORÎ



## XORTÊ BÊ WIJDAN

Rojekê kalek (Pîremêr) li hespê xwe siwar dibe bi xizmet diçe gundê cîran. Ew di rêda rastê xortekî tê, ku li ber tava havînê kesiriye û westiyaye, hema ku bi rêva diçe,

Gunehê kalê pê tê, xort davêje terkiya xwe û diçin. Bi rê de ewê xort tiştên xirab tîne ber dilê xwe û ji xwere dibêje: "Bi Xwedê ezê kulmekî li patika stuyê kalo xim û hespê wî jê bistînim, li vê çolê kê hay ji kê heye?". Berî lêxistinê ew ji kalê di pirse:

- Kalo, mirovê ku xirabiyê bike, ew xirabî çend salê dî şûn de tê pêşiya wî?".

- Kê dizane lawo, carna du-sê sal şûn de, carna jî bîst sal şûn de tê pêşiya wî.

Di pey vê gotinê de xort kulmekî li patika ustuyê kalê dixwe, wî ji ser hespê tîne xwarê û li hespê wî swar dibe diçe. Kal demekê şûnda bi ser hişê xwe de tê, radibe dide ser rê û diçe. Pir diçe hindik diçe, carek bala xwe didê ku waye ewê xort ji ser hespê ketiye û bazinê ustuyê wî şikestiye. Qêrînekî wî li erdê, yek li ezmanê. Kal li ser serê wî ra diweste û dibêje: "Xorto, yê ku neheqiyê dîkin, bi vî awa<sub>z</sub>ê jî bi ser bela xwe ve dibin".




-Xwedê mala te xira bike, ne min ji te pirsî, dema ku mirov xirabiyê bike ew xirabî kengê tê pêşiya wî, te got "heta deh salan jî dikşîne" lê ya min qet saetek jî ne kişand.

Kalo dibêje:

-Kurê min, vê tiştê ku îro hate pêşiya te, ji bo xirabiyên te yên berê ne lawo, lê ji bo xirabiyê ku te bi min re kir, wê paşê bê pêşiya te.

Têmûrê Xelîl Mûradov

1-5-1983 Rewan



ÇEND PIRS

1)Tiştên ku xwarinê şor û şêrîn dikin navên wan çine ?.

Bersiv: ..... .

2)Bi tirkî,kalem,kitap, defter,silgi ye. Bi kurdî navên wan çi ne ?-

B: ....., ....., .....,.....

3)Gelo di salekê de çend demsal hene û navên wan çi ne ?.

B: .....,.....

4)Gelo di salekê de çend hefte,çend meh û çend roj hene ?.

Meh Hefte Roj

B:.....

5)Kurdên ku li serê çiyar li diji neyar şer dikin.Ji wan re çi tê gotin ?.

B: .....

6)Gelo Komara Mahabadê di kîjan salî de ava bû û di kîjan salî de faşilî

B: di .... de avabû,di .... de faşilî(faşil bû)

7)Amed, Silêmanî, Mahabad û Qamişlok li kîjan beşê Kurdistanê ne ?.

B:Li Kurdistana ....., li Kurdistana .....  
li Kurdistana ....., li Kurdistana .....

BERSIVA HEJMARA 10'AN

1) Di devê mirov de çend diran hene ?.

Bersiv: 32.

2) Gelo hun dizanin di laşê mirov de tiştên dîtinê, bêhnkirinê, bihîstinê, tamkirinê çine?

B: Çay, Poz, Guh, Ziman

3) Tiştêkî sor e û di laşê mirov de digere. Gelo ew çi ye ?.

B: Xwîn

4) Di nav kelê serê mirov de tiştêk heye, navê wî çi ye ?.

B: Mejî

5) Yê ku di nav devê mirov de ye ew çi ye ?.

B: Ziman

6) Sê dan xwarina rojê. Gelo hun dizanin navên wan çi ne ?.

B: Taştê Nav roj Şîv


7) Cejna Newrozê, ji bilî gelê Kurd di nav çend netewên din de jî tê pîroz- kirin, Gelo ew kîjan in ?.

B: Îran, Pakistan û Hindistan.

8) Ala Gelê Kurd ji çend rengan pêk tê û navên wan rengan çi ne ?.


B: Ji çar rengan pêk tê, ew jî kesk, sor, zer û spî ne.

ÇEND ÎŞARETÊN RÊ (Trafîk)



1

.....




2

.....




3

.....



4

.....



5

.....

Navê van îşaretên jorîn li binê wan  
binivîsin û li gorî rengên wan reng bikin.

## XAÇEPIRS

	1	2	3	4	5	6
1						
2				■	■	
3						■
4			■			
5	■					■

Çepe rast: 1- Li Kurdistanê navê bajarekî. Vî Bajarî ku, gêlê wê bajarê li dijî dagirkerên Tirkan demekê dirêj ji bo mafê xwe yê Netewî şer kirine.

2- Ne ew e.

3- Reben-Hêjar (berepaş)

4- Roja berê Şemiyê. Bi şev ronahî dide (Berepaş)

5- Ne ronî (berepaş)

Sere jêr: 1- Meriv tê de diçe hûndirê Xanî

2- Dildarî

3- Kûsiyê nav avê

4- Bi zimanê biyanî, navê jina pêşî

5- Deynê şergo li Araz e , Araz di şûna di-  
rev de genim da şergo û ew..... bûn.

BERSIVA XAÇEPIRSA HEJMARA 10.

	1	2	3	4	5	6
1	Z	A	G	R	O	S
2	E	M	E			A
3	L	A	N	D	I	K
4	A	D	I	R		
5	L	E	M	A	N	

BERSIVA RÛPELA 34'AN.

(Çend îşaretên rê )

- 1: Tunêl.Lewha zer û sor
- 2: Rê ya xeter.Li pêşiya te derya he ye! .
- 3: Rê ya şemtok!.
- 4: Rê ya teng (li pêş rê teng dibe)!.
- 5: Rawestandînin qedexe ye!.Lewha şîn,nava wê sor

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr

BIHA